

## Nameyên Sersaxiyê

**Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê.**

**Malbata Nemir Mamoste Ismaîl Omer.**

Bi dilekî xemgîn , bi êş û keder me nûçeya koçkirina nemir, serokê partiya yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriye mamoste Ismaîl Omer bihîst. Ez bi navê malbata Cegerxwîn sersaxiya Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê û heval û endamên wê û malbata nemir dikin. Bila serê milletê Kurd sax be, û her û her wê di bîra me de bimîne û ji bîr nabe. Xwedê wî bi dilovaniya xwe şa bike û cihê wî bihişt be.

**Stockholm 18.10.2010**

**Malbata Cegerxwîn  
Kesra**

\*\*\*\*\*

Sed heyf û mixabin bavê Şiyar koça dawî kir.

Malbata `Emo.....

. Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê Heval, dostên wî..

Belê, pakrewanê xebatkar û welatparêzê Kurd mamoste Îsmâil Omer koç kiriye nav karwanê şehîdên milletê Kurd. Ber bi jor ve bilind dibe û bi tîrêjên ronahîya roja jîndar re wê dara azadîyê şîn, bi ber û fêkî bihêle.

Bavê Şiyar bi vê çûna xwe- ya ku ne di çaxê xwe de bû- dilê her Kurdekî bi kul û xem kir.

Ez bi navê malbata Mela Ehmedê Namî sersaxiya gelê Kurd , partî, heval û hogirên Xwedê lê xweş be dikim. Hêvîdar im ji yezdanê pak û dilovan, ku cîgehê wî buhuşt be.

De bere serê milletê Kurd û serê we sax be.

**Samî Ehmed Namî  
Stockholm. 2010.10.18**

## Nameyên Sersaxiyê

**Behîname**

**Roj baş kek.....!**

Di navbera hevnasîya me de, deh sal derbas bûn, lê min hûn qet ji bîrnekirin. Karguzarîya ku we ji min re kir, ez çicar ji bîrnakim. Hûn di dilê min de heya roja mirinê dijîn. We di dilê min de, cîyekî taybetî standiye birayê delal. Ji xwîşka min re silavên min bêje. Têm çavên hersê xortan. Ji hemû nasan re silavên min hene.

Birayê delal, du demjimêr berê Mahfûzê ji min re tîlefon vekir, nûçek reş da min, ez xemgîn bûm, berketim, kesirîm û dil ji min parçe bû. Got "Kek Îsmâil çûye heqîya xwe". Belê birayê delal, nûçek wisa, nûçek reş e. Lê, em çî bikin, zagona xweza wisa ye; kes di vê cîhana derewîn de nemaye. Em gîşt rêwîyê wê riyê ne. Lê, bi rastî mirin hêj ji kek Îsmâil re zû bû. Ji ber ku ew hê ciwan bû, wexta wî ya mirinê nebûbû. Lê, em çî bikin keko, çavên felekê kûr be, li ciwan û kalan nanêre. Ji xwe em Kurd bi piranî di ciwantîya xwe de dimirin, yan jî dijmin me dikuje. Serê we sax be, serê zarokên wî sax bin, serê gelê Kurd sax be.

Kek....., bi kerema xwe van gotin û vê peyama min bigîhîjîne neferên malbata kek Îsmâil û heval û hevriyên Partiyê.

Carek dî "serê we sax be" dibêjim, tîm çavên te maç dikim, saxî û serkeftina we dixwazim. Silav û rêz.

**Riza ÇOLPANÊ DERSIMÎ  
19-10-2010 Sydney**

\*\*\*\*\*

**Heval û dostên partiya Yekîti**

Bi xemgînî me nûçeya koçkirina birêz Ismail Imer serokê partiya we bihist. Ew mirovekî kurdhez û xebatkar bû, hemû jiyana xwe di ber doza gelê xwe de terxand. Hêviya sebir û aramî bi we û malbata wî dikim.  
**Salih Cefer Holenda**